موئەیەد مەغدید (جێگری لیژنەی ئۆلۆمپی کوردستان):

گەڕانەوەی یەکێتی تۆپی پێی عێراقی بۆ دۆخی جارانی زەحمەتە

لیژنەی ئۆلۆمپی کوردستان لەساڵی ٢٠٠٦ دامەزراوە، سەرپەرشتی ٣٠ یەکێتی وەرزشی دەکات، لەهەریەک لەشارەکانی (هەولێر، سلێمانی، دهۆک، کەرکوک)، سەبارەت بەچەند پرسێکی تایبەت بەو لیژنەیەو ڕەوشی وەرزشی لەکوردستان بەگشتی، بە پێویستمان زانی دیمانەیەک لەگەڵ موئەید مەغدید جێگری لیژنەی ئۆلۆمپی کوردستان سازبکەین.

دیمانە: دەنگی مەخموور

*** ئەگەر بکرێ باسێکی ئیشوکارەکانی لیژنەی ئۆلۆمپی کوردستان بکەیتو کەی دامەزراوە؟**

- بەڵێ، دوای یەکگرتنەوەی هەردوو ئیدارەی کوردستان لە ٢٠٠٦/١١/٦ لەڕێوەرەسمێکی ڕەسمی یەکگرتنەوەی هەردوو لیژنەی ئۆلۆمپی ڕاگەیەنرا، ئەوەبوو لیژنەی ئۆلۆمپی کوردستان دامەزرا، بەسەرۆکایەتی (مەلا بەختیار)و دوو جێگری (موئەیەد مەغدید، مامۆستا سەلاح)ی بۆ دانرا. سەبارەت بەنیشوکارەکانی لیژنەی ئۆلۆمپی زیاتر ڕێککەتنو سەرپەرشتی کردنی یەکێتیەو وەرزشییەکانی کوردستانە، ئێستاکە لەکوردستان ٣٠ یەکێتی وەرزشیمان هەیە لەهەریەک لەشارەکانی (هەولێر، سلێمانی، کەرکوک، دهۆک) کە بنکەی سەرەکی لەشاری هەولێرە، هەریەک لەو یەکێتیەو وەرزشییانە سەرپەرشتی وەرزشو ڕێکخستنی خولەکان دەکەن بۆ پێگەیاندنی وەرزشوانانی کوردستان.

*** کێشەی بەشداریکردنی یانەی هەولێرو نەجەف لەخولی یەکێتی ئاسیا بەکوێ گەیشت؟**

- پێموایە بەشداری نەکردنی هەولێرو نەجەفو یانەی نەورۆزی سلێمانی هەر سێ یانەکە کۆتایی پێ هاتووە، لەبەر ئەوەی کاتەکەی تەواوبوو، ئێمە وەکو لیژنەی ئۆلۆمپی کوردستان ناڕازیی بووین بەبڕیاری سڕکردنی یەکێتی تۆپی پێی عێراق، لەبەر ئەوەی پێمانوایە وەرزش لەعێراق زەرەرمەند دەبێت هەروەکو هەردوو یانەی کوردستان (هەولێرو نەورۆز) دابڕان لەبەشداریکردن لەخولەکانی ئاسیا، دوای ئەوەی بڕیارەکە کۆتایی هات ئێستا خەریکن بەخۆیان دابچنەوەو ئەو سزایەی لەسەر یەکێتی تۆپی پێی عێراق هەیە لابەبن، دیارە ئەمەش دەدەستێتە سەر ئەوەی کە تاچەند عێراق بەخۆی دادەچێتەوە لەسەر ئەو بڕیارانەی کە پێموایە کارێکی زەحمەتە.

*** دەکرێ بزانین پرۆژە یاسای لیژنەی ئۆلۆمپی کوردستان لەپەرلەمانی کوردستان چی بەسەرهات؟**

- لەهەڵبژاردنی پەرلەمانی کوردستان یەکەمجارببو لیژنەیەکی تایبەت بەوەرزش دابنرێت، کە ئەمەش جێگەی خۆشحالیە، سەبارەت بەو یاسایە تائێستا لەپەرلەمانی کوردستانە ڕەزامەندی لەسەر وەرنەگیراوە، چەندین دانیشتمان سەبارەت بەو یاسایە کردووە، بەڵام دیارە گەورەترین کێشە ئەوەیە تا ئەم یاسایە نەخرێتە بواری جێبەجێکردنەوە کێشەکان وەکو خۆی دەمینێتەوەو بوودجەی دیاریکراویشمان نابێت. ئێستاکە ٢٠٠ ملیۆن وەکو مینەحەی لیژنەی ئۆلۆمپی وەردەگرینو دابەشی سەر ٣٠ یەکێتی وەرزشی و لیژنەی ئۆلۆمپی دەکەین. هیوادارم پەرلەمانی ئەمجارە کار لەسەر ئەو یاسایە بکات، کە لەساڵی ٢٠٠٧ پێشکەشی پەرلەمان کراوە.

*** باس لەوە دەکرێ لەکوردستان زیاتر گرنگی بەیاری تۆپی پێ دەدرێت لەبەرامبەر یارییەکانی دیکە ئەمە بۆچی؟**

- هۆکاری ئەمە دەگەڕێتەوە سەر یانەو وەرزشییەکان، زۆرێك لەئەندامانی دەستەی کارگێڕی یانەکان گرنگی بەتۆپی پێ دەدەن، جگە لەوەش یاری تۆپی پێ ئیمکانیەتێکی زۆری دەرێ ئەمەش لەسەر حیسابی یارییەکانی دیکەوە دەبێت. ئەگەر چی کۆنگرەیەك لەساڵی ٢٠٠٦ لەلایەن وەزارەتی وەرزشو لاوان بەسترا، کۆمەڵێ راسپاردەو مەرجیان دانا کە بەپێی خاڵ ئەگەر هەر یانەیەك چ یاریەکی هەبێ خاڵێکی بدرێتێ لەسەر ئەم خاڵانە بوودجەی پێ بدرێت، بەڵام بەداخەوە ئەم بڕیارە جێبەجێ نەکرا، ئێستاش یانە هەیە لە ١٠ یاری لەخولی نایابە، بەڵام تاکو ئێستا بودجەی دوو یاری وەردەگرێت، ئەمەش کێشەیەکی گەورەی دروستکردووە دەبوایە وەزارەتی وەرزش و لاوان ئەمەی چارەسەر بکردبا.

*** زۆر یاریزانی کورد ئەوانەی دەستکەوتی گەورە لەدەرەوەی وڵات بەدەست دێنن گلیبی دەکەن وەکو پێویست هاوکارییان ناکرێ ئەمە تاچەند ڕاستە؟**

- پێموایە ئەمە ڕاست نییە، چونکە هاوکاری زۆر کراون، ئەو یاریزانانەی کە دەچنە دەرەوە بەناوی عێراق دەچن، دەبێ عێراق ڕێزیان لێ بنێت، بەڵام ئێمە وەکو لیژنەی ئۆلۆمپیو یەکێتیە وەرزشییەکانی کوردستان پێش عێراق ڕێزیان لێ دەنێینو هاوکاریان دەکەین، کەچی ئەوان بەناوی عێراق دەچن، بەڵام ئێمە ڕەچاوی ئەوە دەکەین کە ئەوان یاریزانی کوردنو سەربەرزیەکەی بۆ کورد دەگەڕێتەوە، لەم ڕوانگەیەوە هاوکاریان دەکەینو کردووماینە.

*** لیژنەی ئۆلۆمپی کوردستان تاچەند سەربەخۆیە لەکارکردنیدا؟**

- پێموایە لیژنەی ئۆلۆمپی کوردستان زۆر بێ لایەنو سەربەخۆ ئیشوکارەکانی خۆی دەکات، هەرچی بڕیارە لەکۆبوونەوەکانی لیژنەی ئۆلۆمپی لەنوشینگەی جێبەجێکردن دەردەچێت، ئێمە مانگانە کۆبونەوەی خۆمان هەیە، هەرچی بڕیارێك لەلیژنە دەربچێت بەزۆرینەی دەنگ دەردەچێت.

هەواڵە وەرزشییەکان

عەبدولڕەحمان ئادەم- هێمن گەلاڵی

عێراق و فیفا دانووستان دەکەن

وتەبێژی حوکمەتی عێراق عەلی دەباغ ڕایگەیاند کە هەولێکی نوێنی لەگەڕدایە بۆ چارەسەرکردنی کێشەی یەکێتی تۆپی پێی عێراق لەگەڵ فیفاو دەیانەوێت کۆتایی بەم کێشەیە بهێنن کە ئێستا وەرزشی عێراقی تێکەوتووەو هەروەها دەباغ وتی: نامەوێت بەس لەناوەرۆکی ئەم هەوڵە بکەین کە لەگەڵ دامودەزگا وەرزشیە نێودەوڵەتییەکاندا کردوومانە.

ئادریانۆ دەیەوێت لەگەڵ توتی یاری بکات

یاریزانی هەڵبژاردەی بەرازیلو یانەی فلامینگۆی ئەو وڵاتە لەتازەترین لێدوانیدا بۆ میدیاکان ئەوەی ڕوونکردەوە کە ئێستا ئاستی یاری کردنی لەیانەکەیدا زۆر باشبووەو هیچ کێشەو گرفتێکی لەیاری کردندا نییە. ناوبراو ئەوەشی ڕاگەیاند کە خوازیارە بگەڕێتەوە بۆ ئەوروپاو لەیانەی ڕۆمای ئیتالیدا لەگەڵ کاپتنی یانەکە (فرانچیسکۆ تۆتی)دا یاری بکات. گوتیشی "یانەی ڕۆما خەونی لەمێژینەم بووەو لەئێستادا بۆندێکیان پێشکەش کردووم منیش واهەست دەکەم ئێستا کاتی ئەوە هاتووە بگەڕێمەوە بۆ ئەوروپاو لەیانەی ڕۆمادا یاری بکەمو بۆندەکەیان قبوڵ بکەم.

مارادۆنا هیوای بە گاگۆ نییە

دیگۆ ئەرماندۆ مارادۆنای ڕاهێنەری هەڵبژاردەی ئەرجەنتین وای بۆ دەچێت کە بوونی یاریزانی یانەی ریال مەدرید گاگۆ لەپێکهاتەی هەڵبژاردەکەی کە بەشدارە لەجامی جیهانی ٢٠١٠ شتێکی گرانە بەهۆی دابڕانی لەیاریگاکان بۆ ماوەیەکی درێژ، هەروەها مارادۆنا هیوای بە گاگۆ نییە بەهەبوونی لەپێکهاتەکەیداو دەڵێت "سێ مانگی تەواو تێپەڕیو هیچ بەشداریەکی نییە، کاتی هەیە بۆ گەڕان بۆ یانەیەکی ترو کارێکی زەحمەتە لەگەڵمان بێت بۆ جامی جیهانی داهاتوو.

گواردیۆلا: نابێت بەکەم لە شتونگارت بنوارین

پیپ گواردیۆلای ڕاهێنەری بەرشەلۆنە یاریزانانی یانەکەی ئاگادارکردەوە بردنەوەی یانەکەیان لەخولی ئیسپانی نەبێتە هۆی بەکەم زانین بۆ یانەی شتونگارتی ئەڵمانی. پیپ لەلێدوانێکیدا ئاگاداری کردنەوەو وتی "دەبێت هەنگاو هەنگاو بچینە پێشەوە ئەگەر ماندوێتی دەبین بەپاڵەوانو بردنەوەمان ٤ - ٠ لەڕایسینگ ئەنجامێکی باشو دڵخۆشکەرە، بەڵام ئەوە بەس نییە بۆ ڕووبەڕووبونەوە لەگەڵ شێوازی ئەڵمانی لەتۆپی پێدا".

کریستیانۆ ڕۆنالدۆ:

دڵنیام لەسەرکەوتنمان بۆ قۆناغی داهاتووی چامپیۆس لیگ

هێمن گەلاڵی

بەرامبەردا لەگەڵ یانەی لیۆنی فەرەنسیدا شکستی خوارد. بۆیە یانەی شاهانەی مەدرید لەیاری گەڕانەوەدا کە بڕیاری شەوی ٣/١٠ لەناو یاریگای سانتیاگۆ بێرنابۆدا بەڕێوە بچێت دەبێت بە ئەنجامی (٢ -سفر) یارییەکە ببانەوە بۆ ئەوەی خۆی بگەیەنێتە قۆناغی داهاتووی خولەکە، کریستیانۆ گوتیشی یانەکەمان بەرامبەر یانەی لیۆن دۆڕاندیو ڕۆیشتو هەمو یانەیەکیش دەدۆڕێت، بۆیە دەبێت وانەی لێ وەربگرینو کاردانەوەیەکی زۆرباشمان هەبێت بەرامبەریان لەکاتی گەڕانەوەیاندا.

شایەنی باسە ڕۆنالدۆ لەلێدوانێکی تایبەتدا بۆ ماڵپەری سەرەکی یانەی ریال مەدرید گوتی "سەرکەوتنمان بەسەر یانەی ڤیاریال بەو ئەنجامە باشە هاندەرێکی گەورە دەبێت بۆ بەرزکردنەوەی ووڕەی یاریزانەکانمان بۆ باشتر یاریکردن لەخولی چامپیۆس لیگو سەرکەوتن بەسەر یانەی لیۆندا". لەکۆتاییدا کریستیانۆ گوتیشی "دووبارەی دەکەمەوە دڵنیام لەسەرکەوتنمان بۆ قۆناغی داهاتووی خولی یانە پاڵەوانەکانی ئەوروپا".

حەبیب عەبدولستار ئەحمەد بۆ جاری دووەم دەبێتە باشترین یاریزانی باڵەی تازەپێگەیشتووان

عەبدولڕەحمان ئادەم

یاریزانی لاوی مەخموور (حەبیب عەبدولستار ئەحمەد)ی تەمەن شانزە ساڵ بۆ ماوەی سێ ساڵە لەتیپی باڵەی ناوەندی وەرزشو لاوانی مەخموور بۆ تازە پێگەیشتووان یاری دەکات. ئەم یاریزانە بۆ جاری یەکەم لەپاڵەوانێتی باڵەی تازە پێگەیشتووانی ناوەندەکانی وەرزشی لەساڵی ٢٠٠٨ بەشداری تێداکردو توانی ببێتە باشترین یاریزان لەم پاڵەوانێتیە کە تێیدا ناوەندی وەرزشو لاوانی مەخموور پلەی دووەمی بەدەست هێنا. بۆ جاری دووەمی لەسەریەك یاریزانی لاو (حەبیب عەبدولستار) لەهەمان پاڵەوانێتی (پاڵەوانێتی باڵەی تازە پێگەیشتووانی ناوەندەکانی وەرزشی) کە لەمانگی ڕابردوو لەشارۆچکەی ڕواندز بەڕێوەچوو بەهەمان شێوە خەڵاتی باشترینی یاریزانی پێدرا دوای ئەوەی ئاستێکی زۆر بەرزی لەم پاڵەوانیەتیە نیشاندار لەنێوان سەرجەم یاریزانانی هەر هەشت ناوەندی وەرزشی کە لەم پاڵەوانێتییە بەشداربوون توانی ببێتە باشترین یاریزان.

شایەنی باسە بەڕێوەبەرایەتی وەرزشو لاوانی هەولێر لەپلانی چالاکییەکانی خۆیدا چەندین خولو پاڵەوانێتی لەم جۆرە بۆ ناوەندەکانی وەرزشی ئەنجام دەدات کە ساڵانە چەندین یاریزانی لاوی تێیدا بەدەردەکەوێت کە ئەمەش بناغەیەکی باش بۆ پێشکەوتنی وەرزش لەکوردستانو پێگەیاندنی ئەم یاریزانە لاوانە ئەرکێکی پیرۆزەو جێگەی دەستخۆشیە خەڵات بکرێنو زیاتر هان بدرێن بۆ ئەوەی بەردەوام بن لەسەر یاریەکان.

میژووی یانەی گورگەکان

زیلان خۆشناو

گورگەکان ئەو نازناوەیە کەوا یانەی ڕۆمای پێی ناسراوە، هەموو کەسێك لەتێمەبەوناوە دەیناسێتەوە کە گوێبیستی دەبێت. یانەی (ئەی ئێس ڕۆما) لە شاری ڕۆمای پایتەختی ئیتالیا دروستبووە لەئەنجامی یەکگرتنی هەرسێ یانەی (فورتیتادو برو ڕوماو ئەلباو ڕۆما) بەسەرپەرشتی (ئیتالو فوشتی) کە ئەوکاتە گەورەترینو دەولەمەندترین کەس بوو لەڕۆمار سەرۆکی یانەی فورتیتادور برو ڕۆما بووە، دوای کۆبونەوەو گفتوگۆو وتوێژی زۆری هەرسێ یانەکە لەکۆتاییدا بڕیاریاندا یەك یانە پێکبێنن ئەو یانەیەش (ئەی ئێس ڕۆما) بوو، کە لە ٢٢ تەموزی ساڵی ١٩٢٧ بەشێوەیەکی فەرمی ڕاگەیەنرا بەهاوکاری (دیل فیکا ڕێو) کە دەیوت (بەدڵنیایەوە ئاشقانی تۆپی پێ ڕۆما دڵخۆش دەبن کە دەزانن هەرسێ یانە یەکیان گرتووە تا ببنە یەك یانەی بەهێزو نوێنەری شاری ڕۆما بکەن).

دوای ڕێکەوتن لەگەڵ ڕاهێنەری یانەی جێنەوا (غابورت) وەکو بەڕێوەبەری هونەری یانەکە، بەفەرمی لەوەرزی ١٩٢٧ -١٩٢٨ بەشداری لەخولی ئیتالیا (کالچێو)کرد. هەرچەند ئەنجامێکی زۆرباشی بەدەست نەهێناوە تائێستا ٣ جار نازناوی خولی ئیتالی بردۆتەوە لەوەرزەکانی (١٩٤١ - ١٩٤٢)، (١٩٨٢ -١٩٨٣)، (٢٠٠٠ - ٢٠٠١). تۆڵۆمپیکۆ دی ڕۆما یاریگەی یانەکەیەو شۆینی (٨١٩٣٠) کەس دەبێتەوەو دووەمین گەورەترین یاریگایە لەئیتالیا لەدوای (سانسیرۆ) لەمیلانۆ. لەوکاتەوەی دامەزراوە تائێستا ڕەنگی زەرد سور دەپۆشن بۆ ئەوەی دژایەتی یانە بەهێزەکان باکوری ئیتالیا بکات. لەکاتی یەکگرتنی سانەکانی پایتەخت تەنها یانەی لازیۆ لەڕۆما ڕازی نەبوو بچێتە ناو ئەم ڕێکەوتنەی هەرسێ یانەکە لەبەرتەوە لەم کاتەوە تائێستا دژایەتیەکی مێژووی هەیە لەنێوانیان. ئەو نازناوانەی یانەی ڕۆمای پێی ناسراوە گرنگترینیان (il4pi)، گورگەکان، هەروەها نازناوی (Lam agica)، سیحرباز. لەساڵی ١٩٢٩ ئیتالیو فوتشی یانەکەی جێهێشت لەجێگەی ئەو (ڕیناتو سالکیردوتی) هاتە شوێنی هەر چەندە یانەی ڕۆما دەستکەوتێکی زۆری نییە بەڵام ئیتالیەکانو هاندەرانی وەرزش لەئەوروپا ئەو یانەیان زۆرخۆشدەوێ یانەکەیە توانیویەتی شوێنی خۆی لەمێژووی تۆپی پێ ئیتالیاو ئەوروپا بکاتەوە. چەندین یاریزانی بەناوبانگ لەجیهان یارییان بۆ ئەویانەیە کردووە لەوانە (فرانچیسکۆ تۆتی) ئەفسانەی ڕۆما نازناوی ئیمپراتۆر یان پاشای ڕۆمای پێ بەخشراوە، لەساڵی ١٩٩٢وە تائێستا یاری بۆدەکاتو ١٠ ساڵە کاپتنی یانەکەیەو خاوەنی هەموو ژمارە پێوانەییەکانە لە ڕۆما کە تەنها دڕێسی ڕۆمای لەبەرکردووە بەدڕێژایی ژیانی وەرزشی. جگە لە تۆتی چەندین یاریزانی بەناوبانگی تر یارییان بۆ یانەی گورگەکانی کردووە لەوانەش (جیۆدۆ ماسێنی) گۆلچی یانەی ڕۆمابووە، (ئەمیدو ئەمادی) هێرشبەربووە، (جیاکولوموزی) ئەفسانەی ڕۆماوی نازناوی دڵنی ڕۆمای لەلایەن هاندەران پێ بەخشراوە، (بڕونوکی کۆنتی) سەرکردەی هەشتاکان یەکێکە لەویاریزانانەی جەماوەرێکی زۆری هەبووە لەڕۆما، هەروەها (ڕوبرتۆ بڕۆتزی) دووەم گۆلکاری مێژوویی لەڕۆما دوای یاریزانی تۆتی یەکێك بووە لەباشترین هێرشبەرانی هەڵبژاردەی ئیتالیا، (تەلدایر دوسانتۆس) وەك بەرگریکارو (گابریل عومەر باتیستۆتا) یەکێك بووە لەباشترین یاریزانی ڕۆما هەر چەندە لەسێ وەرز زیاتر یاری بۆ ڕۆما نەکردووە، بەڵام ئاستێکی زۆربەرزی نیشان داوە لەو ماوەیەدا. چەندین یاریزانی دیکەی بەناوبانگ یاریان بۆتەم یانە گەورەیە کردووە. دەستکەوتەکانی یانەی ئەی ئێس ڕۆما لەوانە: (خولی ئیتالیا ٣ جار، ١٣ جار پلەی دووەم لەهەمان خول، جامی ئیتالیا ٩ جار بوەتە پاڵەوان، ٨ جار لەهەمان خول پلەی دووەم، جامی سوپەر ئیتالیا ٤ جار، ٢ جار پلەی دووەم لەهەمان خول، جامی یەکێتی ئەوروپا یەك جار). یانەی ڕۆما یانەیەکی گەورەیە بەپێوانەی شارەکە یەکێکە لەشارە گرینگەکانی ئەوروپا بەهەمان شێوە یانەکە بەیانەی وەفاکە ناسراوە ئەوەی باسمان کرد بەشێکی زۆر کورت بوو لەمێژووی گەورەیی یانەکە. لەکۆتاییدا (١٠) یاریزان لەو یاریزانانەی زۆرترین یاریییان بۆیانەی ڕۆما کردووە دەناسێنین: (فرانچیسکۆ تۆتی ٣٩٥ یاری ژمارەی پێوانەیی- جیاکۆمولوزی ٣٨٦ یاری- سێرجیو سانتارینی ٣٤٤ یاری- جویدو ماسینی ٣٣٩ یاری- جیوزیبی جیانینی ٣١٨ یاری- تەلدایر ٣١٢یاری- برۆنۆ کۆنتی ٣٠٤ یاری- ئەرکادیۆ فینتۆری ٢٨٨ یاری- فولفیو بێرناردینی ٢٨٦ یاری- سباستیانۆ نیلا ٢٨١ یاری).

Li Mexmûrê rewşa perwerdehiyê

Mihemed Orhan

Li Wargeha Penaberan a Mexmûrê sê dibistanên seretayî, dibistaneke navîn, dibistaneke amadeyî (lîse) û sê pêşdibistan hene. Bi gişti hêjmara xw endekarên dibistanên li Mexmûrê 2 hezar û 819 kes e

Penaberên wargeha Mexmûrê di sala 1993-94'an de ji ber zordariya dewleta tirk mal, milk û her tiştê xwe di cih de hêlan û neçar bûn penaberî başûrê Kurdistanê bibin. Yan diviyabû cerdevaniyê bipejirînin, yan jî cih û warê bav û kalên xwe bi cih bihêlin û bikevin riyeke ku kes nizane bi ku ve diçe. Lê gelê kurd ê qehreman, fedekar û welatparêz cerdevanî nepejirand û neçar bûn penaberî başûrê Kurdistanê bibin. Bi vî awayî jî pêl bi pêl gelê kurd dest bi penaberiyê kir; hinek ber bi metrepolên Tirkiyeyê ve çûn û hinekên din jî neçar bûn derbasî başûrê Kurdistanê bibin... Piraniya penaberên ku li wargeha Mexmûrê dijîn, ji herêma Botan û Colemêrgê ne. Rawestgeha yekem a penaberan herêmên di bin kontrola gerîlayên azadiyê, herêmên Şeraniş û Bihêrê bûn... Ji bo ev gel ji aliyê Neteweyên Yekbûyî ve wekî penaberên siyasî bên pejirandin, hejmarek penaber di 12'ê hezîrana 1994'an de li Dewra Barzan (taxeke Zaxoyê) ketin greva birçîbûnê û di encama greva birçîbûnê ya 28 rojan de daxwazên wan ji aliyê Neteweyên Yekbûyî (NY) ve hatin qebûlkirin û weke penaberên siyasî hatin pejirandin.

Li vê derê jî dewletê destê xwe dirêjî gelê kurd kir û neçar bûn di 12'ê îlona 1994'an de ji Şeraniş û Bihêrê koçî deşta Bêsivê hatin kirin. Di nava zorî û zehmetiyên jiyanê de sê mehan li deşta Bihêrê man. Piştî vê yekê ji aliyê NY'ê ve di 11'ê mijdara 1994'an de ji Bêsivê hatin rakirin û li dû wargehên cuda yên bi navê Geliyê Qiyametê û Etrûşê hatin bicihkirin. Piştî bicihbûna penaberan ya li wargehên Etrûş û Geliyê Qiyametê ji sala 1994-97 an hejmara wan giha 15 hezarî û bi awayekî rêxistinî jiyana xwe ya penaberî berdewam kirin... Di 14'ê nîsana 1997'an de wargeha Etrûşê parçe parçe hat valakirin; hinek ji wan li wargehên wekî; Qesrok û Sêmêlê bi cih bûn. Penaberên ku mayîn jî ji wargeha Etrûşê bi piyan derbasî herêma Nînova bûn. Penaber di 13'ê sibata 1998'an di şeva tarî de ji Nînovayê koçî Nehdarê kirin û ji wir jî 23-24-25'ê gulana 1998'an ji aliyê rejîma Sedam ve derbasî çola Mexmûr hatin kirin.

REWŞA PERWERDEHIYÊ

Penaberên wargeha Mexmûrê di dîroka xwe ya penaberiyê de yek ji xalên herî girîng ku bi wê yekê navê xwe li dîroka kurd û Kurdistanê bi tîpên zêrîn nivîsandî; di aliyê xwendin û nivîsandina bi zimanê dayikê de gaveke mezin avêtin. Bi vî awayî ji rawestgeha yekem bigire heta bicihbûna li cola Mexmûrê, her tim di nava gel de herî zêde tiştekî rola xwe dileyîst xwendin û nivîsandina bi zimanê kurdî bû. Zarokên penaber di nava şert û mercên herî zor de fêrî xwendina bi zimanê dayika xwe bûn û parastin. Ji tunebûnê hebûn afirandin, bi pênûsekê pirtûkên zêrîn nivîsandin.

DIBISTANÊN LI WARGEHÊ

Li wargehê sê dibistanên seretayî, dibistanek ya navîn (orta okul), dibistanek ya amadeyî (lise) û sê dibistanên dayikî (ana okul) hene. Mirov dikare dibistanên li wargeha Mexmûrê bi vî awayî rêz bike;

a- Dibistanên Seretayî: Ev dibistanên Seretayî destpêkê di salên 1994'an de li wargehên wekî Bihêrê û Şeranişê dest bi perwerdeya zimanê kurdî kiribûn. Di wê demê de derfet kêmbûn, ders li ser keviran dihat dayîn, ne defter, ne pênûs û ne jî pirtûkên wan hebûn. Piştî hatina penaberan ya Etrûşê, Neteweyên Yekbûyî dibistan avakirin û hinek derfet dan zarokên wargehê. Niha li Mexmûrê sê dibistanên seretayî yên bi navê Dibistana Ş. Salih Kendal, Ş. Mihemed Karasungur û Dr. Mihemed Nûrî Dêrsimî hene. Mamosta bi xwe ji wargehê ne, bi xwe bernameyan amade dikin û xwendekaran dikin xwedî zanîn.

b- Dibistana Navîn Ya Ş. Jiyan: Ev dibistan di sala 1996'an de li wargeha Etrûşê ji aliyê mamostayên wargehê bi xwe ve hat avakirin. Navê xwe ji şehîd Jiyan digire, şehîd Jiyan di encama êrişekê ya li ser wargehê de hatibû şehîdkirin.

c- Dibistana Amadeyî Ya Ş. Koçerîn: Ev dibistan di sala 2000'an de li wargeha Mexmûrê hat avakirin. Navê xwe ji mamostaya bi navê şehîd Koçerîn digire.

Ji derveyê wan her sê dibistanên seretayî, yek ya navîn û yek ya amadeyî, niha li wargeha penaberan a Mexmûrê sê dibistanên dayikê (ana okulu) yên bi navê dibistana şehîd Nûjîn, şehîd Çîçek û şehîd Mizgîn hene. Ji berî ku xwendekarên ku nû tên wergirtin derbasî refa yekem ya seretayî bibin, li van her sê dibistanane ji aliyê mamostayan ve tên perwerdekirin û piştre jî derbasî dibistana seretayî dibin. Bi gişti hejmara

xwendekarên dibistanên Mexmûrê 2 hezar û 819 kes in. Ji van xwendekaran nîve xort û nîva din jî keç in. Yanî mirov dikare bêje di aliyê hejmarê de hevsengiyek di nava xwendekarên keç û xort de heye. Bi vî awayî xwendekarên ku niha amadeyî bi dawî kirin û wê îsal derbasî zanîngehê bibin, ji 80 kesan zêdetir e. Her wiha hejmara xwendekarên ku li zanîngehên başûrê Kurdistanê jî dixwînin 212 ne. Ji derveyî vê hejmarê nêzî 30 xwendekarên wargehê mezûn bûne. Ji van xwendekarên mezûn bûyîn çendek ji wan li wargehê wekî mamosta bûne xwedî erk. Tê texmînkirin ku di perwerdeya 2009-2010'an de nêzî 20-25 xwendekarên

din ji zanîngehên başûrê Kurdistanê ji beşên cuda cuda mezûn bibin.

LI ZANÎNGEHÊN BAŞÛR

Li zanîngehên başûrê Kurdistanê xwendekar li hemû beşan hene. Herî zêde jî xwendekarên wargehê li beşên wekî; beşa hiqûq, ramyarî, bijîşkiya giştî, bijîşkiya diranan, kîmya, fizîk, biyolojî, ragihandin, sosyolojî, zimanê kurdî, îngilîzî adab, îngilîzî binyat, îngilîzî perwerde, derûnasî (psîkolojî) û coxrafya bicih bûne.

Dema nû xwendekarên wargehê derbasî zanîngehê dibin bi zoriyên pir mezin re jî rû bi rû dimînin. Hinek ji van zoriyane jî tênegihiştina ziman, çand û alfabeyek cuda ye. Dîsa jî di çûyîna xwendekaran ya zanîngehê jî zorî tên jiyîn û ev jî dibe sedem ku di xwendekaran de paşketinek çêbe. Ew jî ew e ku dema zanîngeh dest pê dike, hinek salan du meh jî derbas dibin, lê hêj navê xwendekarên wargehê ji wezareta perwerdeyê nehatine.

KURSÊN CUDA...

Dema mirov temaşeyî wargehê jî dike, ji derveyî dibistanên taybet, di heman demê de di bin navê dibistanê de ji kesên temen mezin û yên ku xwendin û nivîsandina wan tune re dewreyên perwerdeyê (kurs) yên cuda cuda têne vekirin û ew kes li van derane fêrî xwendin û nivîsandina zimanê kurdî dibin. Ev dewreyane jî li gorî dem, derfet û pêwîstiyan têne vekirin, hejmara xwendekaran jî li gorî pêwîstiyan tê destnîşankirin. Tevlibûnek gel a zêde jî ji van dewreyan re çêdibe. Her wiha di konferansa mamostayan ya ku li sala 2009'an hatî çêkirin de biryar hate girtin ku dewreyên bi vî awayî hîn zêdetir çêbibin û bên domandin.

MAMOSTE AMADE DIKIN

Li dibistanên wargehê tevahiya pirtûkan ji aliyê mamostayên wargehê ve tên amadekirin. Lê mixabin di dema çapkirin û zêdekirina van pirtûkan de zoriyên teknîkî yên pir mezin tên jiyîn. Ji ber li wargehê çapxaneyek nîne ku ev pirtûk lê bêne zêdekirin û derfetên malî jî rê nade ku ev pirtûk ji aliyê dibistanê ve bêne zêdekirin. Li dibistanan zoriyên herî mezin jî di aliyê dersên coxrafya, kîmya, fizîk, biyolojî û dersên kompîturê de têne jiyîn. Sedemê wan jî nebûna amûrên teknîkî yên wekî; laboratuvar, kompîtur, mikroskop û hwd.

BI DERFETÊN XWE...

Berî sala 2005'an Neteweyên Yekbûyî di aliyê çêkirina cil û bergên dibistanê, anîna defter, pênûs û amûrên din ên dibistanê de arîkarî li gel dibistanên wargehê dikir. Wekî din dibistanên wargehê yên niha ji aliyê NY'ê ve hatîne çêkirin. Lê mixabin di van 3-4 salên dawî de bi yekcarî ev arîkarî hatiye birîn. Jixwe heta niha hikûmeta navendî ya Iraqê di tu aliyan de arîkarî nedayîne dibistanên wargehê. Di heman demê de piştî 2005'an Hikûmeta Herêma Kurdistanê di hinek aliyan de destê xwe yê arîkariyê dirêjî dibistanên wargehê kir. Ev arîkarî jî dayîna mûçeyek biçûk (mûaş) ya ji bo mamostayên wargehê, çûyîna xwendekarên wargehê ya ji bo zanîngehê û carinan jî zêdekirina pirtûkên dersane. Kêm jî be, lê dîsa Hikûmeta Herêmê arîkariyekê li gel dibistanên wargehê dike.

PIRSGIRÊKÊN HEYÎ

Bêguman li dibistanên wargehê pirsgirêkên perwerdeyê yên cidî jî hene û mirov dikare wan pirsgirêkan di du xalan de wiha rêz bike;

3 Çêkirina dibistanan. Bi taybet jî cihê dibistana navîn û amadeyî biçûk e û hejmara xwendekaran jî zêde ye. Bi vî awayî di aliyê cih de zoriyên mezin çêdibin.

3 Di aliyê amûrên teknîkî yên wekî; laboratuvar, kompîtur, zêdekirina pirtûkên dersan, nebûna parkek ji bo zarokan, nebûna pergalên ji bo xwendekarên dibistana dayikê, saheyên sporê, amûrên sporê, amûrên çandî û hwd. de zoriyên mezin tên kêşan.

REWŞA TENDURISTIYÊ

Li wargehê di aliyê tenduristiyê de zoriyên pir mezin çêdibin û ev yek jî herî zêde bandorê li ser zarokan çêdike. Di aliyê civakî de li pêşiya xwendinê tu astengî ji aliyê malbatan ve çênabin. Jixwe hevsengiya hejmara xwendekarên keç û xort vê yekê ji mirov re dide diyarkirin. Di heman demê de di konferansa gel û ya mamostayan de jî biryar hatiye girtin ku her xwendekar neçar e heta dibistana navîn biçe dibistanê û dest ji dibistanê bernede. Kêm jî be di aliyê aborî de astengî derdikevin, ji ber di hinek malbatan de kes nîne bixebitin û ev yek jî dibe sedem ku hinek zarok dest ji dibistanê berdin û ji bo derbaskirina jiyana malbata xwe diçin kar û li gel aboriya malbatê dibin arîkar. Ev yek jî bandoreke mezin li ser xwendekaran dike. Bêguman di aliyê ewlekariyê de bandorek mezin li ser wargehê çêdibe. Her tim wargeh hedefa dijminên gelê kurd e û her gotinek siyasî bandorê li ser wargehê jî çêdike. Bi taybet operasyonên dewleta tirk yên ku ji derveyî sinor têne çêkirin, dema wezîrek yê dagirkerên Kurdistanê tên Iraqê û bi rayedarên Iraqê re li ser wargehê biryarekê digirin; bandoreke mezin li ser wargehê û bi taybet jî li ser zarok û xwendekaran çêdibe.

PIRTÛKÊN OCALAN

Li dibistanên wargehê ji derveyî zimanê kurdî, dersên biyanî yên wekî tirkî û îngilîzî têne dayîn. Ji derveyî van herdû zimanên biyanî, li dibistanên navîn û amadeyî dersa bi zaraveyê soranî jî tê dayîn. Di konferansa mamostayan de biryar hat girtin ku pirtûkên Rêberê Gelê Kurd ên nû jî wekî ders bêne dayîn û ev biryar jî bi erênî hat pêşwazîkirin. Her wiha di heman konferansê de biryara zêdekirina hinek dersan jî hat dayîn. Ev ders jî ev in; çand û exlaq, jinelojî û ekolojî ne. Ev ders jî tenê li dibistanên navîn û amadeyî têne dayîn

ناونیشان
کوردستان - هەولێر – مەخموور
www.mexmurpress.com

جەلال خەیلانی - چریکە مەخمووری
کارزان غەمگین - هەڵمەت فاخیر

پەیامنێران

خەلیل پاڵانی
عەبدولڕەحمان ئادەم

دەستەی نووسەران

مۆبایلی سەرنووسەر
٠٧٥٠ ٤٦٥ ٥٤٦٣